

Adarname

[8ê Adarê, 12ê Adarê, 21ê Adarê - Newroz, Kurdistan û Mikro Federasyon]

Heyva adarê adeta bû meydana şahî û pîrozîya, şîn û behîya. Li milekê bîrînan rojên têkoşînan, li milekê serhildan û berxwedanên balkêş, li milekê seramonîyên fermîkirina belgeyên dewletî û herweha aksiyona Newrozê û bizava hilbijartinên şehridarîya 28ê adarê li Kurdistanê Bakur û Tirkîyeyê, rojeva Kurdan bi giştî dagirt û mişt kir... Kurdan ji serê meha adarê were nikarî serê xwe bixwûrînin û di navbeyna aktivîteyan da hatin û çûn; li wê şîn û behîyê, li wê şahî û pîrozîyê, adeta rojên wan bi bezê ve borîn. Adarên hersal wisa ne, lê di adara evsale da bûyer ketin ser bûyeran. 8ê Adarê "roja jinên rencdar yê cîhanê" ye û kiçên Kurd, dayîkên Kurd, tevayî jinên Kurd hazîrîya wê rojê dikirin ku hem bi bîr binin, hem jî xwastek û daxwazên xwe pêşkêş bikin ku bîr û rehiya navxweyî û derveyî, li ser pirs û pirsgerêkên xwe yê "mirovî û cinsî", serwext û agahdar bikin.

Midehekî dirêj e ku "jina Kurd" di nav bizava azadîya "dayîka mezin", "dayîka niştiman", anku Kurdistanê da ye! "Dayîka niştiman" pîroz e, di berda her tişt têtê dan! Jina Kurd, berî li xwe, li dayîka hemû niştimaniyan, li "dayîka niştiman", li Kurdistanê xwudan derdikeve. Wekî navê "dayîka niştiman" têtê bi lêv kirin, balkêş e, belê operaya bi navê "Dayîka Niştiman" ya ku salekê berî Komara Mahabadê, di Adara 1945ê da li Mahabadê hatîye leyistin têtê bîra mirov! Niştiman, anku dayîk, girtîye, êxsîr e, bindest e, divêt ji bindestan bête azad û rizgar kirin. Grûbek ji endamên Jêkafê (Komela Jîyana Kurdistan) ev opera amade kirin û li Mahabadê leyistin. Mîsyon û temaya operayê "nasyonîzma Kurd" bû.

Di sehneyê da, "Dayîka Niştiman" anku Kurdistan destgîr e, bi qeyd û zincîran girêdayî ye, dîl e û paşê jî zarokên vê dayîkê, zarokên "Dayîka Niştiman"ê xwe diavêjin ber çeperan û "dayîka niştiman" ji destê zaliman rizgar û azad dikin. Opera baleke gelek germ û bilind dikêşe û seyirvan li deqîqeyan li ser pêyan li çepikan didin û sloganên Kurdperwerî û niştimanperwerîyê diavêjin. Di navbeyna "Jin" û "niştiman" da kontakeke gelek dîrekt, xwezayî û sentîmental heye û "jina Kurd", wekî dayîkek, li "dayîka niştiman", anku jin, mêr li dayîka hemû welatîyan, hevniştimanan xwudan derdikeve, di ber da xwûna xwe, jîyana xwe feda dike. Jina Kurd, xwudanê tradîsyoneke têkoşer, bi fedakarîyeke mezin mafên xwe dayne paş, armanca rizgar û azadkirina "niştiman" daye pêş, bi dil û daxwaza xwe neheqî li "xwe" kirîye, maf û azadîyên xwe fedayî têkoşîna azadîya welatê xwe kirine. Belê, "mêrê Kurd" ev fedakarî, cisaret û hêjayîya "Jina Kurd" qet nezaniye, "desthilata xwe" digel vê jina fedakara jîyanê bahrve nekiriye! Jina Kurd, digel hemû zor, zehmet û dijwarîyên jîyanê û sîtema "mêrê Kurd", di şertên evro da jî, di her 8ê Adarê da, hem doza mafên xwe yê "cinsî" dike, hem jî xwezî û daxwazên welatê xwe bi dengê bilind dibêje. Jina Kurd, wekî dayîka şehîdan, dayîka girtîyan, dayîka têkoşerên doza Kurdistanê, li meydana hawarê dike, dijî zordarîya rejîmên kolonyalist têkoşînê dide, lê herweha haj xwe jî bûye, dijî "desthilata mêr" jî derdikeve û di bertekîrîna adet û tradîsyonên kevnare da xizmeta pêşkevîna civat û welatê xwe dike.

Tam di vê rojê da, di 8ê Adarê da li Bexdayê, "Makqanûna demkurt ya Iraqa Federal" jî bi seramonîyeke fermî jî aliye rêvebirîya nû ya Iraqê ve, -ku di serî da berpirsiyarê Amerîkayê, yê Erebên Şî û Sunî, Kurd, Asûrî-Kildanî û Tirkmen têda ne-, hate îmtiza kirin. Ev seramonîye, bi ihtimaleke mezin tesadufen rastî ve "roja jinên rencdar yê cîhanê" hat. Bi tesadufî jî be, rasthatîneke balkêş bû. Ji ber ku 8ê Adarê, li timamî cîhanê wekî roja têkoşîna azadîya mafên jinan têtê pîroz kirin. Ew belgeya li Iraqê hatîye îmtiza kirin jî, piştî dîktatorîya çîsale ya rejîma Beas-Seddâm, demekî nû û ber bi demokrasîyê ve dide dest pê kirin li Iraqê. Di wê belgeyê da, hem bi kem û kêmkî jî be, maf û azadîyên mînimîl yê Kurdan, hem jî li ser tixûbên tengkirî jî be cografîya Kurdistanê di bin îdareya Kurdan bi xwe da, têtê qebûl kirin û fermî kirin. Lewma, di rojê pîrozîya bîrînan têkoşîna maf û azadîyên "jin"ê da, îmtazkirina wê belgeya ku azadîyên Kurdan jî ifade û garantî dike, 8ê Adarê ji bo jinên Kurd bihadartir dike.

Di vê nivîsarê da em dê çar bûyerên giring yê di adarê da pêkhatî, wekî "nameya adarê" rave bikin, bisengîn û biha bikin.

* "makqanûna demkurt ya Iraqa Federal" ku di 8ê Adarê da hate îmtiza kirin

* 8ê Adarê, ku "roja jinên rencdar yê cîhanê" ye

* 12ê Adarê, berxwedana Qamişlo û Kurdên Sûrîyeyê

* 21ê Adarê, ku cejna Newrozê ye

I.

Kurdistanê Mikro Federal

Bi makqanûneke demkurt jî be, li Iraqa nû, îmtazkirina belgeyeke hevpişk, bi serê xwe gaveke pozîtîv û pêşve ye. Prosesêke bi vî rengî berî salekê, -berî 9ê Nîsana 2003ê- nedihate xiyal kirin. Lê evro êdî realîteyeke Iraqa nû, rojhilatanavî û timamî cîhanê ye. Iraqa nû, bi hêza dînamîkên xwe yê navînî bi dest ve nehat. Hêza dînamîkên derve dominant û encamgir bû. Ji ber hindê, di plankirin û dîzaynkirina Iraqa nû da, rola dînamîkên derve bi giranî dibe. Hêza derve jî, herçend koalîsyoneke navneteweyî hebe jî, gelek aşkera Amerîka ye û ew xwudan desthilat e. Di avakirina Iraqa nû da projeya Amerîkayê bû bîngê û li ser wê projeyê Iraqa nû têtê ava kirin: Iraqa Demokratîk û Federal. Di vegirtina Iraqê da, ji nav dînamîkên navînî tinê Kurd xwudan hêz bûn û roleke mezin jî leyistin. Armanca Kurdan û projeya Amerîkayê tinê di „navê projeyê“ da hev digirt, lê di naveroka projeyê da, dîtin û xwastekên Kurdan û niyetên Amerîkayê tam neketin serhev. Ji xwe Erebên Şî û yê Sunî li gotina „federal“ jî gelek germ nebûn û bi zehmetî hatin qani kirin ku hêj jî nerazîbûna xwe didomînin. Di nav kêmanîyên biçûk da Suryanî-Kildanî tifaqdarên Kurdan bûn, lê Tirkmen bûne darûdesteyê dewleta Tirkîyeyê û şûna ku maf û berjewendîyên xwe biparêzin, bi armanc û xwastekên dewleta Tirkîyeyê ve rabûn. Di riberiza „federalîzmeke çawan“ da jî „alî“yan tinê Kurdan çarçoveyeke makqanûnî amade kirin û xwastekên xwe formûle kirin. Lê belê, ji ber ku Kurd di nav xwe da duser bûn, nikarin wê belgeya xwe di maseya bazarê da bi ser bêxin. Li milekê, dijberîya Ereban, ya Tirkmenan, li milekê jî hem Iran, Sûrîye û hem jî Tirkîyeyê destwerdanên provokatîv kirin ku prosesa zelalkirina çarçoveya makqanûna demkurt têkbidin.

Di rewşeke wisa da, Amerîkayê jî balansa navxweyî ya Iraqê bo xwe kire binasekî sereke û di encam da çarçoveya xwe bi „alî“yan da qebûl kirin. Li goreyî vê belgeya ku Amerîkayê bi Kurd û Ereban daye îmza kirin, federalîzm di serê pîramîda “dewleta sentral” da tete qebûl kirin. Belêm cografyaya Kurdistan, anku Kurdistan, ji aliyê tixûbî ve hatiye teng kirin. Pîrsa Kerkûkê, ku bûye „namûsa“ xwastek û armancên Kurdistan, hatiye hilawistin û paşxistin. Ji vê „nezelalî“yê xuya dibe ku çareserîya Kerkûkê û herweha Xaniqîn, Mûsil û Şingarê dê di salên bêt da bi balansa navxweyî bête hel kirin, ku hingê “hêz û şiyar” û konjonktûra navxweyî, ya navçeyê û ya navneteweyî tayînkir dibe. Kurd heke heta hingê xwe serûber bikin û kartên bazara polîtîk di destê xwe da saxlem bikin, dikarin xwastekên xwe bi ser bêxin. Belê, halêhazir ev rewşa nezela, potansiyelen tehlikeyan di nav xwe da disitirîne, ku dê di paşerojê da bibe serê arêşe, giriftarî û aloziyên dijwar. Di vê belgeyê da tiştê bi pozîtîvî hatiye piştrast û misoger kirin, fermîkirina tixûbên 1992ê, anjî bi gotineke dî, tixûbên paralela 36ê ne. „Rêvebirîya Kurdistanî Iraqê“, bi îmkarîna vê makqanûna demkurt, hem di nav Iraqê da, hem jî di meydana navneteweyî da fermiyet wergirt, ku eve bi serê xwe di şertên heyî û evro da, di konjonktûra rojhilatanavî û cihanê da, relatîven destkevteke gelek giring e. Êdî Iraq, dewleteke, komareke federal e. Di nav vê dewleta federal da, Kurdistan jî cografîyan, anku bi navê xwe „xwudanê idareya xwe“ye.

Li vê derê, bêyî ku bikevin nav detayan, em dê li ser çar xalên giring rawestin:

* Tixûbên paralela 36ê, ji Dihok, Hewlêr û Silêmanîyê pêktên. Ev xale, ji aliyê fermîbûna navxweyî û navneteweyî ve, bi navê Kurdistanê, bi parlament û hukumeta Kurdistanê ve gaveke pêş û giring e. Lê belê, ji aliyê hêz û şiyana Kurdistan ya di vegirtina Iraqa nû da, li ber rol û berpirsiyarîya Kurdistan ya beramberî Iraq, rojhilatanavî û cihanê ya di warê ewlehiyê da, gaveke li paş e. Binasê sereke jî, dubendî û duserîya Kurdistan bi xwe ye. Kurdistan bi vê berbelavî, duserî û dubendîya navxwe, nikarin hêz û şiyana xwe, rol û berpirsiyarîya xwe ya pozîtîv vegêrin destkevteke mezintir ku bigihin tixûbên rastî yên Kurdistanî Başûr. Di vî warî da, rêvebirîyên polîtîk yên Kurdistanî Başûr, nikarin xwe li paş mazereta „konjonktûrel ya rojhilatanavî, ya nav Iraqê û navneteweyî“ veşêrin. Ji ber ku, heke rêvebirîyên „zer“ û „kesk“ di parlament, hukmet û hêza asayîşî da xwe kiriban yêk, da pozisyona xwe xurttir bikin û bi vê hêza yêkgirtî ya navxweyî, dikarin çarçoveya destkevteke xwe firehtir bikin. Pêşniyara hevrayî ya „desthilatên zer û kesk“ ya „makqanûnî“ bo Iraqê jî, di pozisyoneke „duserî“ da hate kirin, lewma giraniya ku jê dihate hêvî kirin, nîşan neda. Ereben Şîî û Sunî, soz û biryarên ku di demê „opozisyonî“ da dayî, di vê rewşa nû da, ji bîr kirin û ji „duserî“ya Kurdistan jî gelek baş istifade kirin û pêyên xwe li ber teklîfên Kurda asê kirin û bi vê helwestê jî, rê li ber Kurdistan birin. Amerîka ji xwe di bin fişara dewleta Tirkîyeyê da bû û ev dijîtiya Ereban bo xwe kire binasek konkret û mil neda planê Kurdistan. Amerîkayê ev pozisyona xwe ya goya „bêalî“ di lehê Kurdistan da bi kar neîna. Eve wekî paradoksekê dê bête dîtin, lê di encam da Amerîkayê rola xwe ya „bêalî“tîyê li goreyî berjewendîyên xwe bi kar îna, „etîk“ raman nekir û ew hevkarîya stratejîk ya Kurdistan ya di vegirtina Iraqê û hilweşandina rejîma Seddam û hetta girtina Seddam bi xwe da, li ber çavan negirt. Evro, piştî “azadkirina Iraqê”, baş xuya dibe ku, Amerîka li goreyî stratejîya xwe ya bi navê “projeya rojhilatanavî ya mezîn”, -qet nebe di roja evro da-, naxwaze, “guhoriñên gelek, anjî ultra radîkal” pêkbîne li rojhilatanavî. Ji ber ku armanca xwe ya mezîn û stratejîk bi dest ve îna ye, rejîma Beas-Seddam hilweşandîye û Iraqa nû li goreyî daxwazên xwe ji nû ve organîze û dîzayn dike. Piştî kontrolkirina vî çeperê stratejîk, Amerîka dixwaze statûkoya heyî êdî bi metodên li goreyî xwe “rasyonel”, biguhore, di demekî fireh û dirêj da pêkbîne, bi gotina xelkî, bi sebir û bêhna fireh, “berên statûkoyê” bi lihazeyan [manîvelayan] ji cih bike. Ev “hêdî bizivîna” Amerîkayê û “leza Kurdistan” hev nagire. Ji ber hindê jî Amerîka di pratîka Iraqê da wekî planê xwe realize dike, Iran, Sûriye û Tirkîyeyê jî raman dike û li goreyî vê konseptê xwe “hêdî” gavan diavêje! Li ber vê pozisyona Amerîkayê, plan û projeya ku bi navê „makqanûna demkurt“ hatiye qebûl û îmza kirin, ji aliyê Kurdistan ve helbet gaveke pêş e, serkevînek e, lê belê di eynî demî da destkevteke “paşve” ye jî. Ev encama paradoksal, herweha paradoksa Kurda jî nîşan dide. Di şertên „nebûnîyê“ da bi destêxistina van mafan helbet hissîyata Kurdistan germ, geş û têr dike.

Belê, li goreyî têkoşîna Kurdistan, bi serxwe ve hatin û organîzebûna ji 1992ê were, destkevteke mezîn li meydana nîne. Ji aliyê cografî ve tixûbên tengkirî, ji milê polîtîk û ekonomîk ve jî desthilateke tixûbkirî li ber çav e. Fermîbûna vê çarçoveyê, “paşve” jî be, helbet serkevînek e û destkevteke e! Di serkevîtin û destkevta evro ya “paşve” da, berpirsiyar hêzên desthilatdar yên „zer“ û „kesk“ in. Van hêzên xwudan desthilat, ne dezgehên wekî parlament, -gerçî parlament bibû yêk, lê formel bû, ne fonksiyonel bû-, hukmet û asayîşe, -ku temsîla hêza neteweyî dikin-, kirin yêk, ne jî rê dane „hêza sivil“ ku daxwaz û xwastekên xwe yên mezîn û firehtir bilind bikin. Xelk bi timamî li ser armanc û navê “federasyonê” hate manîpûle kirin û ji xwe alternatîvên dî yên wekî, “serxwebûn”, anjî “konfederasyonê” qet nehatin bi lêv kirin. Ji axivtinên ajîtatîv yên li ser “mafê Kurdistan yê serxwebûnê jî heyê” pêve tiştêkî pratîk nehate kirin. Keys nehate dan ku xelk bi azadane hemû alternatîvan riberiz bike, ku heke ev keyse hatiba dan, ku grûb û kesên alternatîvên “serxwebûn” û “konfederasyonê” diparêzin jî propaganda û ajîstasyonê bikin, xelk da gelek bi zêdehî ve rehiya xwe ji bo serxwebûnê dîyar bike. Di demekî gelek teng û direng da rêdana organîzebûna hêza sivil ya „ji bo referandûmê komkirina înzayan“ jî, -ku nêzîkî milyonek û nîvan îmza komkiribûn-, di rewşeke wisa da nedikarî guhoriñêkê pêkbîne. Ji xwe hêzên desthilatdar, yên “zer” û “kesk”, hêz û şiyana Kurdên parçeyên dî û yên diasporayê qet nedan ber çav û guhên xwe, têkilîyeke xurt û berwer digel wan nedanan, hêza wan ji bo piştgirîya xwe nedan mobilîzekirin ku di bazara digel Amerîka û Ereban da xwe pê saxlem, xurt û qaîmtir bikin. Digel hindê jî, parçeyên dî yên Kurdistanê û xelkê Kurdistan yê li diasporayê, bi timamî ji ber bîr û bawerîyên xwe yên paqij û bijûn yên welatperwerî û neteweperwerî piştevanîya Kurdistanî Başûr û rêvebirên wan kirin ku ya rast jî ew bû.

* Zimanê fermî yê Iraqa nû, bi vê belgeyê pêve dibe Erebi û Kurdî. Helbet zimanên kêmanîyên dî jî, Asûrî-Kildanî, Ermenî û Tirkmenî jî di perwerdeya wan bi xwe da dê bête bi kar înan. Belê, Kurdî û Erebi dê bi hev ra di belgeyên „dewletî“ da bêne bi kar înan; di paseport, pûl û kaxezên bankê da. Di parlamento, dadgeh, hukmet û „konferansên fermî“ yên dewletê da Kurdî û Erebi dê digel hev bi kar bên. Li dezgehên “federal” yên li navçeya Kurdistanê jî, Erebi dê bête karînan. Rojnameya fermî ya dewletê jî dê bi Kurdî û Erebi bête weşandin... Bi vê xalê ve, zimanê Kurdî êdî, ji statûya

zimanê xelkekî bê dewlet derdikeve, dibe zimanê dewletê, di organ û mekanîzmayên dewletê da fermî û fonksiyonel dibe, ku eve di nav "destkevta tixûbteng" da, destkevta herî mezin e, ku zimanê Kurdî dikeve nav mekanîzmayên navdewletî jî.

* Hêza polîs û asayîşa navxwe, -navê hêza pêşmerge nabore-, têne parastin. Eve herwekî xala li ser „ziman“î gelek giring e, ku Kurdistan timamî ewlehî û asayîşa xwe dê bi hêzên xwe yê xwumal biparêze.

* Helbet di referandûmeke ji bo makqanûn anjî qanûneke giştî da, hebûna mafê "vetoyê" jî, ji bo Kurdan "garantîyeke" giring e. Bi vê yêkê, rê li ber otorîteya "nifûsa boş û mezin" jî tête birîn, ku di warê parastina mafên "neteweyî" û "etnîkî" da, destê "kêmanîyan" xurt û qaîm dike û herweha binaxeya demokrasîyê jî saxlem dike.

Di çarçoveya giştî da, qebûl û îmzakirina vê belgeyê, „makqanûna demkurt ya Iraqa Federal" hem ji bo Ereban, hem jî ji bo Kurdan û kêmanîyên dî, piştî dîktetoriya Beas û Seddam, „azadbûnek e", „rizgarbûnek e". Li aliyê dî, vê federalîzmê belkî Ereban û kêmanîyên dî yê biçûk, Asûrî-Kildanî, Ermenî û Tirkmen razî kirin, şa kirin, belê Kurd ne "gelek" razî ne, ne jî "gelek" şa ne! Federalîzma evro, li goreyî têkoşîna Kurda, rol û giraniya wan ya di hilweşandina rejîma Beas û Seddam da, di avakirina Iraqa nû da, ne layiqî Kurdan e. Tiştêkî aşkeraye ku pêşengîya demokrasî û ji nû ve avakirina Iraqê Kurdan kirin, lewma ew hêjayî statûyeke mezintir bûn. Ji ber hindê, çarçoveya federalîzma Iraqa nû, ji aliyê maf û azadiyên ekonomîpolîtîk û cografî yê Kurdan ve teng e. Lê belê, „qencê xiraban" e, „ehwenî şer" e! Lê di prosesa azadiya Kurd û Kurdistanê da, gaveke bihadar e, çûku di ber da bedelên giran hatine dan. Binaxeya vê destkevte saxlem e, destkevteke helal e, ji ber ku di bin da ji xwûn û renca paqij ya xelkê Kurd pêve tiştêkî dî nîne. Di vê prosesê da, hêza xelkê Kurd, digel hemû şaşî û kêmasîyan û destkevteke "paşve" jî be, ji aliyê di serî da PDK û YNKê û partî, grûb û şexsiyeten jîr yê Kurd ve, hate organîze û mobilîze kirin. Lewma ew hemû jî hêjayî rêz, vîn û pîrozîya herî ji dil in. Rewş û statûya nû, ji bo bi destxistina armanc, xwezî û daxwazên mezintir, gaveke gelek giring e û tête hêvî kirin ku çet nebe ji evro pêve, organên giring yê dewletbûnê, yê wekî parlement, hukûmet, polîs, pêşmerge, anku timamî hêzên asayîşî, daîre û dezgehên dî yê fermî, bêne yêkkirin, daku ev "destkevte" bête mezintir kirin, ku têhnekê bide derûdorê xwe jî!

Lê belê, digel hemû bihazanîna "têkoşerîya rêvebirên xelkê me", divêt aşkera bête gotin ku, di vê „makqanûna demkurt ya Iraqa nû ya federal" da, „Komara Iraqa Demokratîk û Federal, ji du komarên federal, Komara Federal ya Kurdistanê û Komara Federal ya Ereban, pêktêt" naête gotin. Binê termê „Hukûmeta Kurdistanê ya Rêgional", -Kurdistan Regional Government-, anku „navçeyî" anjî „herêmî" tête xîç kirin. Ji ber hindê, hewceye ev rewşa nû, li goreyî „senga xwe" bête mana kirin, ne kê, ne jî zêde! Di çareserîya problema Kurd û Kurdistanê da, helbet ev belgeya nû ji gelek alîyan ve ji peymanana 11ê Adara 1970ê pêşvetir û konkrettir e, lê ji federalîzmên hevnimûne yê li cîhanê jî paşvetir e. Navê „rêgional" herçend ji aliyê rêvebirîyên polîtîk yê Kurdan ve wekî „federasyon" tête tercume û mana kirin jî, lê encama ji bo Kurdistanê derketîye meydanê, di navbeyna „otonomî û federasyonê" da ye, anku ji otonomîyê pêşvetir, anjî „makro otonomî", ji federasyonê paşvetir, anjî „mîkro federasyon" e. Tixûb û çarçoveya ji bo xelkê Kurd û welatê wan Kurdistanê hatiye vebirîn, mixabin ku têrker nîne. Heke li ser vê encamê „hissî" bête rawestan, hingê helbet mirov dikare bêje ku, „serkevîneke gelek mezin e"! Belê, heke lojîk û objektîv bête raman kirin, mirov nikare rêvebirîyên polîtîk yê Kurdistanê Başûr, spesîfîken di bazarkirina vê makqanûna demkurt da, gelek serkevî bibîne. -Ku yêk ji endamên Kurd yê „Rêvebirîya nû ya Iraqa" Dr. Mehmûd Osman jî kême zêde di vê çarçoveyê da gazinde dikirin-. Ev, -bi gotina herî nerm-, kêmasîya wan, wekî hergav tête dubare kirin, ji dubendî û duserîya wan têtin. Fatûra vê „kêmasîyê" jî ji bo xelkê Kurd tête birîn, ku bedelê wê jî ne sivik e!

Bi nav kirina statûya Iraqa nû, wekî „Komara Demokratîk, Plûral û Federal ya Iraqa", di „ji nû ve dîzaynkirina rojhilatanavîn" da, kilîl e. Bi taybetî welatên cîran, yê ku Kurdistan dagîr kirî, li ber vê nimûneya Iraqa nû, an bi hêza dînamîkên navxweyî, anjî bi hêza dînamîkên derveyî, mecbûr in xwe biguhorin. Vê prosesê dest pê kirîye û zû an direng dê encaman biafirîne! Nişan û werarên vê yêkê têne dîtin. Tirkîye, Iran û Sûrîye, piştî „dîzayna nû ya li Iraqa" nikarin statûkoya xwe ya kevnare bi îsrar bidomînin û biparêzin. Rewşa Iraqa nû ji vî alî ve dê bibe binasekî guhorînê, bibe modelek. Hem Amerîka, hem jî Yêkîtiya Ewrûpayê û welatên dî yê „demokratîk" dê hergav nimûneya Iraqa bidine ber çavên Iran, Sûrîye û Tirkîyeyê. Iraqa nû û statûya nû ya Kurdan, dê ji bo Kurdên parçeyên dî jî bibe motîvasyonêk û modelê mînimîal çareserîyê. Statûya evro ya Kurdistanê Başûr, ji bo parçeyên dî jî, êdî di bazara digel dewletên dagîrker da, „xeta sor" e. Mînimûm çareserî ev e û li ser vê „mînimîalîte"yê dê zêdehî bête kirin, heke hêz û şiyar hebe helbet! Tête hêvî kirin ku, rêvebirîyên polîtîk yê Kurdên başûr, ji tecrubeyên heta evro dersê wergirin, di demê „salnameya prosesa makqanûn û hilbijartinan" da, ku heta dawîya 2005ê hatiye plan kirin, xwe bi hêztir bikin, ya herî giring dawî li vê „duserîyê" bînin, ku bikarin çarçoveya mafên xelkê Kurd firehtir bikin û tixûbên Kurdistanê bigihînin ser rastî û heqîyê.

Di encam da; di serê vê sedsala bîst û yêkê da, mîkro jî be "federalîyek" hatiye bi destxistin. Ev tabloya ku ji 92ê were derketîye meydanê, êdî çêbûn û gihîştina navika dewletbûnê ye. Di vê dewletbûnê da du sîmbol, ku yêk ji wan, anku ziman, hebûna neteweyekê nişan dide, ya dî jî, anku "alaya perçem" ku ew jî objektîven temsîla neteweyekê dike, di nav "reelpolîtîk" a dinyayê da, di nav tixûbên "fermî" yê Iraqa federal da jî be, bi navê xelkê Kurd û welatê wan Kurdistanê, fermîyet wergirtine ku ew jî du ala ne; ziman ku alaya dengîn e û alaya çar reng ya Kurdistanê. Ev dewleta navîk, piştî vê belgeya hevsîk ya digel Ereban hatiye îmtiza kirin jî, ji bo armanca serxwebûna Kurdistanê, bo avakirina dewleta serbixwe ya Kurdistanê, zemîneke, qonaxeke, divêt bihayê wê bête zanîn û bi berpirsiyarî bête parastin û herweha bête pêşve birin. Lewma, digel hemû kem û kêmi, teng û biçûkiya çarçove û statûya vê destkevte û herweha digel şaşî û kêmasîyên rêvebirên polîtîk yê Kurdên başûr, ev hebûn û avabûna Kurdistanê Başûr, divêt ji aliyê hemû Kurdan ve bête destek kirin, ku ji xwe piştevaniyeke xurt, aktîv û dînamîk jî, gelek vekirî û ji nîveka dil tête kirin.

II.

Roja jinan

8ê Adarê, roja jinên rencdar yê cîhanê ye. Hem jinên Kurd, hem jî bi tevahî xelkê Kurd, ku wekî xelkekî bindest û hevqeder yê "cînsê bindest" e, vê rojê jî nîveka salên '70î were pîroz dikin. Di wan salên heftêyî da, pîrozkirina 8ê Adarê bi serê xwe aksiyoneke şoreşgerî bû. Afîş hilawîstin, meşîn, kombûn an panelak amadekirin, anjî "şevek" pêkînan, bûyerên mezin bûn. Li ser wan çalakîyan êrişî polîsî, girtin, îşkence û midehekî dirêj di hefsê da man, adeta "rûtin" bû. Bizavên neteweyî yê Kurdan ev roj li goreyî mana û naveroka wê ya şoreşgerî pîroz dikirin. Ji milekê ve, rewşa jina Kurd û hemû jinên rencdar yê cîhanê dihate gotûbêj kirin, li milê dî, ji ser vê roja jinan, bindestiya xelkê Kurd, zulm û zordariya rejîma kolonyalîst ya Tirkîyeyê û berxwedana bizava neteweyî ya xelkê Kurd dihate îfade kirin. Bizavên neteweyî, bi minasebeta vê rojê têkoşîna xwe xurt û gurtir dikir. Li salên '70î xwandekar û ronakbîrên Kurd di destpêkirin û hûnandina bizava neteweyî ya organîze da, hemû bihayên şoreşgerî yê navneteweyî wekî bihayên têkoşîna xwe qebûl dikirin û bi vê baweriyê di her bîrhatina wan rojan da aktivîteyên cuda organîze dikirin. Ewe bibû tarzekî mebat û têkoşînê û herweha tradîsyonek ava kiribû. Di pîrozîyên van rojên navneteweyî da, bizavên neteweyî yê Kurd, li ser naverok û mesajên "unîversal" yê van rojan gelek sadiq diman û ew roj bi rêzdarîyeke hêjayî xwe bi bîr tînan.

Boçî roja jinan

Ji destpêka civatên çîn û navçînî were bahra pitir ya mirovahiyê bi gotina herî sivik, "ezîyetê" dikêşe. Destpêka dîroka civatên çînî, herweha destpêka bindestbûna ducare ya "cînsê jin"ê ye jî. Di her civatên çîneyî da, çîna serdest, "kast"eke, ji nav hejmara mezin û boş ya civatê, grûba herî biçûk e, lê bahra mezin ya "heyîtiyê" di destê xwe da digire. Bi vê zengîniyê, aletekî xurt yê "desthilatê" ava dike û bi vê mekanîzmayê, serdestiya xwe li ser piraniya civatê didomîne. Di vî sistemê zalim da, herdu cînsên rencdar yê mirovahiyê, "mêr û jin" bindest in. Lê belê, wekî cînsê "afirandêr", anjî maka jîyanê, "jin" ducare bindest e. Ev bindestiya jinê, hem di nav çîna serdest da, hem jî di nav çîna bindest da, helbet li goreyî rewş û karakterîstîka xwe, heye. Di vî sistemê nedadyar da, jin hem wekî "mirov" bindesta sistemê rencxwar e, hem jî bindesta "cînsê mêr" e. Hem jina çîna serdest, hem jî jina çîna bindest, di bin "otorîteya mêr" da ye. Ji du çînen cuda, ji du rewş û şertên cuda, muşterekîyeke "cînsê jin"ê derdikeve meydanê, ew jî "li bindestê mêr bûn"ê. Cînsê jinê, her jî destpêka peydabûna civatên çînî were, dijî vê "qedera" xwe têkoşîn daye. Li milekê dijî çîna serdest têkoşîn da, ji milê dî ve jî dijî "desthilata mêr" berxwe da. Di vê têkoşînê da, "cînsê jinê" paradoksa xwe ya "cînsî" jî jîya. Jina çîna serdest, herçend di bin zulma "cînsê mêr" da jî ma, lê dengê xwe nekir, anjî dengê xwe tevî dengê jina çîna bindest nekir. Di "muşterekîya zulm û desthilata mêr" da, eniya jinê, ji ber rewşa çîneyî parçe bû û ev paradokse hêj jî dom dike û heta ku di navbeyna çînan da kendalên kûr û mezin hebin, têkoşîna hevçeperî ya "cînsê jinê" jî pêknaet.

Tiştêkî aşkera ye ku, "têkoşîna maf û azadîyan" her gav ji çîn, navçîn û cînsê bindest dest pê dike. Dîrokçeya bi destêxistina "maf û azadîyên cînsê jinê" jî bi xebat û têkoşîna jinan, belê jinên rencdar, dest pê kir. Jinên rencdar û karker di nav sistemê kapîtalîzma hov ya Amerîkayê da haj xwe bûn, hişyar bûn û doza maf û azadîya xwe kirin. Heta nîveka sedsala 19an jinên rencdar hem ji mêrên rencdar zêdetir dixebitîn, hem zêdetir êş û jan dikêşan, hem jî ji "cînsê mêr" kêmtir heqdest werdigirtin. Vê rewşa nemirovî, bêhna jîyanê li jinan çik dikir û di 8ê Adara 1857ê da li Amerîkayê, bajêrê New Yorkê, jinên di karxaneyên tekstîlê da kar dikirin serhildan û rewşa nemirovî ya ku têda kar dikirin, protesto kirin û dest bi grevê kirin û bi vê çalakîyê xwastin şertên kar û jîyana wan bêne baş kirin. Di timamî silsileyê civatên çînî da, jinê, wekî "cînsê bindest" heta sistemê kapîtalîst karî xwe li ber vê zulma sistemî bigire. Di sistemên "koletî" û "feodalîyê" da, "cînsê jinê" hem di bin zulma "çînî", hem jî ya "mêrî" da tepeser ma û nikarî dengê xwe derêxe! Bi destpêka sistemê kapîtalîzmê, bi giştî çîna karker, spesîfîk jî "cînsê jinê" haj hêza xwe bû ku vê "qedera" xwe qebûl neke û biguhore. 8ê Adara 1857ê milada vê haj xwe bûn û têkoşîna maf û azadîyên "cînsê jinê" ye. Helbet ew roj, "destpêk" bû ji bo "guhoriya qedera jinê". Jinê, wekî "cînsê bindest" çirîska têkoşîna xwe wê rojê vêxist, lê belê geşbûna wê roj û têkoşînê gelek sal kêşan. Jinê bedelên giran dan heta ku wê roja serhildana xwe, hem bi sistemê kapîtalîzmê, hem jî bi "desthilata mêr" bide qebûl kirin.

Milada enternasyonalîzekirina vê roja "têkoşîna jinên rencdar yê cîhanê" bi pêşengîya aladara maf û azadîyên jinên karker û rencdar yê cîhanê, sosyalîsta têkoşer Klara Zetkînê li sala 1910ê li serbajêrê Danmarkê, Kopenhagê, dest pê kir. Di 26-27ê Tebaxa 1910ê da, li Kopenhagê, konferansa jinan ya enternasyonala duyê, pêkhat û di vê konferansê da, bi pêşniyara Klara Zetkînê, ew roja têkoşîna jinên Amerîkayê ya li 8ê Adara 1857ê, li New Yorkê pêkhatî, wekî "roja jinên rencdar yê cîhanê" hate qebûl kirin û ji wê rojê pêve her sal, "8ê Adarê" hate pîroz kirin. Herwekî di zimanê "çîrokan" da têtê gotin, "ew roj yêk û evro du", ew tradîsyon di şertên evro da, hêj jî dom dike. -Ji xwe piştî vê berxwedana bi îsrar ya "jinên rencdar yê cîhanê", Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan-UNê jî di sala 1975ê da, ku ew sal, "sala jinan ya înternasyonal" bû, 8ê Adarê wekî roja mafên jinan fermîyen qebûl kir-. Di vî midehê dirêj da, wekî "cînsê bindest" jinê, têkoşîneke xurt da, bedelên mezin dan ku hem rewşa jîyana xwe "qenctir" bike, hem jî xwe ji bin nîrê "cînsê mêr" rizgar bike. Jinê, evro di cîhana kapîtalîst da, li goreyî "pêşkevîniyên relatîv" hindek xwastekên xwe bi dest ve înanê, lê mixabin hêj negihîştîye armanca xwe. Belê, jin, hêj jî li cîhanê, hem ji ber sistemê kapîtalîstî, hem ji ber tradîsyonên kevnare yê civatê, hem ji ber fundamantalîzm û tabûperestîya dînî, hem jî ji ber "desthilata mêr" di nav "diskrîmînasyon"eke mezin da ye. Bi metodên cuda, rewş û şertên cuda, lê "bindestiya jinê" hêj jî dom dike. Mixabin ku di vê prosesê da "jin", bêbextiya herî mezin ji "hevjinê xwe" jî "mêr" dibîne ku ew paradokseke mezin ya jîyana bi giştî mirovahiyê ye. Digel hindê jî, jin di her 8ê Adarê da, dengê xwe, hawar û gazîya xwe bilindtir dike. Her 8ê adarek, ji berê, biçûk jî be, gavek baştir dibe û ev pêşveçûnê "gavbiçûk" jinan geşbîn û hêvîdar dike ku têkoşîna xwe sist û lawaz nekin, berxwedana xwe firehtir bikin û destkevtên xwe jî hem saxlemtir û hem jî mezintir bikin. Jina Kurd jî di vê têkoşîna navneteweyî da, ji çeperên xwe, ji nav welat, ji Kurdistanê, mil dide têkoşîna jinên rencdar yê cîhanê. Esasen jina Kurd, bi salan e, mil bi milê "mêr" di têkoşîna azadîyê da cih girtiye. Zêdetir bi fedakarîya "nav malê", carna jî wekî pêşmerge û ji dawîya salên 80yî ve jî wekî "gerîlla" di rêzên têkoşîna azadîyê da aktîv bûye. Vê aktîvîyê, rol û pozîsyona "jina Kurd" di nav civatê da mezin û bihadar kirîye, rêzgirtinek peyda kirîye. Gerçî adeten jî têtê gotin ku di nav jîyana tradîsyonel ya xelkê Kurd da "cîhê jinê" cuda ye, jin gul e, kulîlk e", anjî "jin maqûla malê ye", hetta jin carna "serokêşîrîyê" jî dike, di nav şer û dozan da berevaniyê dike, "cîhê jinê lê, şer radiweste", "dest li jinê ranabe" û gelek tiştên dî, ku ew hemû jî di

zemîn û çarçoveya desthilata "mêr" da têne dîtin. Lê eve dîsa ve relatîven rûyê pozîtîv yê madalyonê ye. Di rûyê dî yê madalyonê da, "rastîya jîyanê" heye, ku ew jî bi gotine herî "nerm" perîşanî ye! Bindestîya jinê, li nav malê, li jîyana derve, li kar, li her geha jîyanê bi dilsojîyêke mezin dom dike. Adet û tradîsyonên kevnare, "teessuba dînî", rêz û rêzikên eşîrî û feodalî, mixabin hêj jî jîyana jinê dikin jahr! Jina Kurd, hêj jî "du gava li dûv mêr" diçe. Li gelek deverên Kurdistanê, hêj jî di bin "çarşeva" reş û tarî da ye. Di mahr û evîna jinê da hêj jî zincîra "next" (qelen) heye.

Di tradîsyona pêkve jîyana "jin û mêr" da, hêj jî lîteratûra desthilata "cinsê mêr" dominant e; mêr "şû" nake, "jinê tîne", - ku gotina "şû", di pêkve jîyana "jin û mêr" da, partner e, anjî bi timamî tekabulî gotina "eş" ya Tirkî dike, anjî di manaya "zewac" a Erebi da, "refîq û refîqe" tî ye û herwekî gotinên "partner" û "eş", "şû" jî, ji bo herdu "cinsan", bo "mêr" û "jin" an pêkve bi kar têt û herweha wekî ji "partneran" têtê pirsîn, "me şû bi hevdu kir", dibêjin -!.. Terminolojîya "zewac"ê jî li ber "desthilata mêr" û adetên feodalî têtê bi kar inan. Jin "diçe mêr", anjî "mêr dike" -lê ji bo "mêr", "jin dike" naête gotin!!! Ji ber ku li goreyî vê tradîsyon û "bawerîyê!" xwudanê malê "mêr" e, lewma mêr jinê tîne malê. Wekhevîti nabe! Mêr "hêz" e, "qudret" e, jin jar e, lawaz e, hewcehî bi parastina "mêr" heye! Ji ber hindê jin diçe "mala mêr". Ji bo "mêr" Kurd, jin, hêj jî tinê "dayîka biçûkan e, cihê wê nava malê ye"! Jina Kurd, ji ber vê „konservatîvîya mêr“ ji çerxa „berdêriya ekonomîk“ bi zanahî têtê dûr kirin. „Cinsê mêr“ naxwaze „desthilata ekonomîk“ digel jinê bahrve bike, rênade ku jin di jîyana kar da cih bigire. Mêr nahêle ku jin li ser kesayetîya xwe jî xwudan soz û biryar be. „Jina Kurd“, ji alîyê „mêrê Kurd“ ve hatiye êxsîr kirin. Lêdan, îşkence û tecawizkarîya „mêrê Kurd“ ya li ser „jina Kurd“, mixabin belê bêtixûb didome. Ev rewşa negatîv tinê di nav civata giştî ya Kurd da naête dîtin, di nav goya „elîta Kurd!“ da jî dom dike. Ev „elît“ tinê maskeyê dide ber rûyê xwe, xwe vedîşere, li koçik û dîwana, li mekanên kolektîv, li panel û semînera, axivtinên „hamas“î dikin, xwe goya modern nîşan didin, „jin û mêr wekhev in“ dibêjin, behsê „maf û azadîya“ jinê dikin, lê di pratîkê da, ji „Kurdê rêzê“ cudatir tiştêkê nakin. Kurdê „xwanda“, „ronakbîr“ û „modern“ li nav çar dîwaran, „Kurdê rêzê“ ye, belê li derve bi maske ye, „parêzdarê wekhevîyê“ ye, „modern“ e! Ev „tîp“ê duyê, anku yê bi maske, ji „tîp“ê yêkêmin tirsbartir e. Kurdê rêzê, di derbareyê jinê da, qet nebe, yêkrû ye, çî raman dike, hem li mal, hem jî li derve wisa dike.

Bo Kurdê rêzê, jin, „dayîka biçûkan e, xwarinê çêdike, karê nav malê dike, du gavan li dûv mêr e, ji koçik û dîwanên mêr lê, dûr e û gelek tiştên dî...“! Lê belê, „xwandayê Kurd!“ dur û ye, bîr û bawerîya xwe ya „anormal“ li mal têtbiq dike, lê li derve maskeyê „modernîyê“ dide ber rûyê xwe û xwe wekî „hevtayê jinê“ nîşan dide! Helbet, di nav xwanda û ronakbîrên Kurd da yên ku di pîrsa jinê da, „mirovî“ û modern raman dikin jî hene, ku hem teorîken, hem jî pratîken çawa raman dikin wisa jî dijîn, lê mixabin ku hejmara wan kême e û hetta mirov dikare bêje ku, „îstisna“ ne. Vêca rewşa jina Kurd di seranserê Kurdistanê da, mixabin ku tabloyêke gelek bi xem derdêxe meydanê. Ji ber hindê ye ku, jin li ser jîyana xwe ne xwudan maf û biryar e, nikare „hevjiyê xwe“ hilbijêre. Tinê bab û bira, ne dayîk û xwûşk jî, belê tinê bab û bira xwudan maf, soz û biryar in li ser hemû jîyana jinê û piştî şû kir jî, „mêr“ xwudan desthilat e! Jin, bi van bîr û bawerî û ramanên kevnare, dijmirovî, adeti û paşverû, bûye goya sembola „namûsê“. Di bin „desthilata mêr“ da, her cure „hîzî û dizî“ têtê kirin, belê „namûs“ di „pêşîra jinê“ da têtê dîtin û bedelê vê „namûsê“ jî bi jîyana jinê têtê standin, ku ew „namûs“ jî, ne „namûsa jinê“ ye, „namûsa mêr“ e! Heta evro jî roj nîne ku li Kurdistanê kiçên ciwan, anjî jin bi „tohmata“ „bênamûsîyê“, -ev gotina bênamûsîyê jî di tercumeya van „nobedarên namûsê“ da, heke kiç an jinê bi dilê xwe hej yêkê kir, bi dilê xwe şû kir, yêkser bênamûs e! - bi destê bira, bab anjî lêzimekî dî neête kuştin... Heta ku ev „desthilata mêr“ li ser timamî hucreyên jîyanê hakim be, „hêza mêr“ „qadirî mutlaq“ be, mixabin ku „cinsê jinê“ dê „bindest“ bimîne û jin nikare li ser kesayetîya xwe xwudan soz û biryar be. Rizgarîya jinê di destê wê bi xwe da ye. Belê, mixabin ku „jin“ di bin perwerdeya bi giştî ya mentalîteyê „desthilata mêr“ da, mala xwe jî bi destê xwe xirab dike. „Kur“ê xwe, bi „bîr û bawerîya“ tradîsyonel û dominant ya „desthilata mêr“ perwerde dike, mezin dike û „neyarê“ „cinsê xwe“ bi destê xwe diafirîne! Eve jî paradoksa herî mezin ya „cinsê jinê“ ye! Kengî „jin“ê, xwe ji vî mentalîteyê „hakimîyeta mêr“ rizgar kir, ev nîrê „desthilata mêr“ şkand, maf û azadîyên xwe bi dest ve inan, wekhevîya xwe bi destê xwe, hingê dê jîyana mirovahîyê jî tena û normal be.

Jina Kurd jî, li milekê bo rizgarkirina welatê xwe û azadkirina xelkê xwe, li milê dî jî ji bo maf û azadîyên xwe yên „cinsiyetî“ têtêkoşînê dide. Barê jina Kurd ducare giran e; hem dijî dagîrkeran, dijî desthilata kolonyalîzmê hevçeperîya „mêrê Kurd“ dike, hem jî dijî „desthilata mêrê Kurd“ berxwedide. Lewma 8ê Adarê, „roja jinên rencdar yên cîhanê“, ji bo jina Kurd bi manatir e. Jina Kurd, hem li azadîya welatê xwe, hem jî li azadîya „cinsiyeta“ xwe digere. Ji ber hindê, ev 8ê Adara 2004ê, ji herdu alîyan ve ji bo jina Kurd bi manatir bû. Jina Kurd, hem roja xwe pîroz kir, hem jî di parçeyekî welatê xwe da, li Kurdistanê Başûr, ew azadîya ku mil bi milê „mêrê Kurd“ hatiye bi destê xwe, pîroz kir. Di rizgar û azadbûna Kurdistanê Başûr da rola jina Kurd, -gerçî naête dîtin û zanîn-, lê temetî ya „mêrê Kurd“ e. Bi mohrkirina „makqanûna demkurt ya Iraqa Federal“ ev destkevta Kurdistanê Başûr di meydana navneteweyî da fermîyet wergirt. Bi vê destkevte, parçeyekî welat digel têtêkoşîna jinê azad bû, lê mixabin eve naête manaya azadbûna jinê. Belê jina Kurd, di prosesa azadkirina xwe da, gaveke mezin û bihadar jî avêt. Jina Kurd, ji evro pêve, divêt timamî hêza xwe, digel ji nû ve avakirin û pêşvebirina welat, ji bo bi destê xwe azadîyên cinsiyeta xwe jî bi kar bîne, ku li nav tixûbên fermî yên „Kurdîstana Başûr-(Iraqê) li Iraqa Federal“ xwe jî azad bike. 8ê Adarê tenê, dê ji bo Kurdan ducare bi mana bin û bêne pîroz kirin; hem dê „mohrkirina makqanûna demkurt ya Iraqa Federal“, ku xwastekên mînimîl yên Kurdan têda hatine qebûl kirin, hem jî dê „roja jinên rencdar yên cîhanê“ pêkve bêne pîroz kirin.

III.

12ê Adarê, berxwedana Qamişlo

12ê Adarê, ji bo Kurdên Kurdistanê Bakur herweha bîrhatineke tahl û dijwar e jî. 12ê Adara 1971ê, ertêşa Tirkîyeyê hukumeta Suleyman Demîrel êxist û hukumeta Nîhat Erîm ya ku di bin desthilata wan da, îna ser kar. Bi wê „darbeyê“ leşker dîrekt nehatin ser hukum, lê bi rêya „sivîlên mejî leşker“ bi navê „operasyona balyozê“ nêçîrek dijî şoreşgerên Tirk

û Kurd dane dest pê kirin. Bi sedan şoreşgerên Tirk û Kurd hatin girtin, îşkence dîtin, hatin kuştin. Deniz Gezmiş navdar, ku Kurdê Erzeromê bû, di demê "darbeya 12ê adarê" da hate girtin û 6ê Gulana 1972ê digel du hevalên xwe, Yusuf Aslan û İrfan Uçar hatin îdam kirin. Disa şoreşgerê navdar yê Tirk, Mahîr Çayan û hevalên xwe jî 30ê Adara 1972ê, li gundê Kizildere li Nîksara Tokatê hatin kuştin. Piştî darbeya 12ê adarê, komeleya xwandekarên Kurd ya bi navê DDKO [Ocaxên Kulturî yê rojhilatê yê şoreşger] hate girtin, rêvebir û endamên wê û bi dehan şoreşgerên di yê Kurd jî hatin girtin û li hefsa Diyarbekirê hatin zindan kirin. Wan şoreşgeran 12 sal hukum xwarin. İsmail Beşikçi jî wê demê digel şoreşgerên Kurd, li ser doza xelkê Kurd hate girtin û ciza xwar. Paşê hemû, bi efûya hukumeta Ecewît ya sala 1974ê hatin berdan. Vêca 12ê adara 1971ê çu cara jî bîra Kurdan naçe. Ew dem, ji bo Kurdan demekî reş û tarî ye û herdem li bîr e. Di 12ê Adara hersal da Kurd têkoşîna xwe ya wê demê jî bi bîr tînin û zulm û zordariya rejima faşîst protesto dikin. Rasthatin bêjin, bûyerên Qamişloyê jî tam wê rojê qewimîn.

Çi qewimî

Di meydana pêhola Qamişloyê da, du tîmên pêholê (futbolê), yêk ya Erebên Dêrezorê, ya di ya Qamişloyê, dileyizin. Alîgirên tîma Dêrezorê ji wî bajêrî û dorberê tên. Alîgirên tîma Qamişloyê jî ji bo piştevaniya tîma xwe li meydanê kom dibin. Helbet tradisyona pêholê ye, "tezahurat" dibe. Li goreyî tempoya leyizê, dozaja tezahuratê jî nizim û bilind dibe. Erebên Dêrezorê, hem Sunî ne û hem jî ji berê were nasyonalîst û Beasîst in. Di nav Beasê da jî Seddamîst in. Bûyerên Iraqê, hilweşîna rejima Beasê, girtina Seddam û kuştina herdu kurên wî û ya herî giring jî serkevîna Kurdan, xuya ye rûniştîye nav dil û hinavên Erebên Dêrezorê! Wekî rewşa tîma wan ber bi têkçûnê ve diçe, serê dava tezahurata xwe vedirevinin, tixûb dibezînin û dest bi êrişkarîyê dikin, dijina li Kurdan û serokên wan didin. Alîgirên Kurd jî, bi sloganan dest bi parastina serokên Kurd dikin û dîsa bi sloganan bersiva êrişkarîya Ereban didin. Di dawîyê da, Ereb dest bi êrişê fizîkî dikin. Di vê êrişê da sîlehan jî bi kar tînin, ku xuya dibe bi hazîrî hatine. Polîsên Sûriyeyê jî hevkarîya "hevnijadên xwe" dikin û bi sîlehan êrişî Kurdan dikin. Kurd berxwe didin, lê telafetêke mezin dibe û ji dehan zêdetir Kurd têne kuştin. Roja paştir, di mêşa rakirina şehîdan da, polîs û leşker destûrê nadin ku merasimeke mezin û boş pêkbêt û êrişî Kurdan dikin. Di vê êrişê da Kurd dîsa ve berxwedaneke xurt dikin, lê wê carê jî ji dehan zêdetir Kurd têne kuştin, nêzîkî sed kesan birîndar dibin û bi sedan kes jî têne girtin. Polîs û leşker teroreke nedîtî didin dest pê kirin li nav Qamişlo û dorberê.

Çawa ku ev bûyer tête bihîstin, li timamî bajêr, bajêrk û gundên Kurdan protestoyeke berfireh dest pê dike. Ji Efrînê bigirin, Helep, Kobanî, Serê Kanîyê, Dirbêsi, Amûd, Hesekî û heta Dêrikê û li Şamê jî, Kurd berxwedaneke xurt nîşan didin. Di wan cihan da jî bi dehan Kurd têne kuştin, bi sedan têne birîndar kirin û girtin. Encam ji seda zêdetir kuştî, bi sedan birîndar û girtî. Lê belê, encama herî giring berxwedana xelkê Kurd li timamî Sûriyeyê belav dibe, deng vedide. Kurd di demê desthilata Beasê da, ewil care ku serhildaneke hinde boş dikin, berxwe didin û bi alaya Kurdistanê dimeşin, sloganên polîtîk diavêjin, xwastekên xwe bilind dikin. Vê berxwedana Kurda desthilata Sûriyeyê hem har kir, hem jî êxiste nav tirs û xofên mezin. Berxwedana Kurdan û êrişa dewleta Sûriyeyê, hem li Kurdistanê, hem jî li derveyî welat dengê mezin veda. Kurdan li çarnikarê welat û diasporayê piştevaniyê gelek xurt nîşanî birayên xwe yê başûrarojava Kurdistanê û li Sûriyeyê, dan. Di serî da Amerîka û Ewrûpayê ev êrişkarî û terora dewleta Sûriyeyê, bi serê lêvan jî be, gunehkar kirin û bala wan kêşan ku destan ji Kurdan bikêşin û hetta Amerîkayê ji Sûriyeyê xwast ku leşkerê xwe ji nav Kurdan paşve bikêşe. Ji welat, reaksiyoneke gelek xurt û piştevaniyê germ, ji welatên biyanî jî reaksiyonên "dîplomatîk"î hatin nîşandan.

Êrişa dewleta Sûriyeyê

Rol û hêza Kurdan ya di hilweşandina rejima Beas û Seddam û di girtina Sedam bi xwe da, di nav Erebên bi taybetî hevtixûbên Iraq û Sûriyeyê, reaksiyonek "antî Kurd" peyda kiribû. Ji berê were di hate zanîn ku Erebên dorberê Dêrezor û hevtixûbên Iraqê, meyildarên Beasa Iraqê û Seddam bûn. Wan ji rêvebirîya Şamê û bi taybetî jî ji "klîka Elewî", qet hez nedikirin. Erebên Dêrezor û dorberên wê, rasîst û Seddamîst bûn û lewma jî hindî hûn bêjin "antî Kurd" bûn. Piştî hilweşîna rejima Seddam, Dêrezor û dorberê wê, bû rêbar û penageha Beasîst û Seddamîstan. Erebên wê navçeyê destekek mezin ya lojîstîkî didan êrişkarî û terora li Mûsil, Tikrît û dorberê di hate kirin. Têkilî û dostaniya Kurdên başûr û Amerîkayê jî di dilê wan Ereban da kîn û nefretêk peyda kiribû. Amerîkayê hukumeta Sûriyeyê îxtar dikir ku rê nede revarên Seddamîst û Beasîst. Ji ber vê rewşê, hem Erebên Dêrezor û dorberê, hem jî rejima Sûriyeyê, Kurd bi gîştî, spesîfik jî Kurdên Sûriyeyê, bo xwe potansiyelen tehlike qebûl kirin. Di çavê hukumeta Sûriyeyê da, Kurdên Sûriyeyê, di destê Amerîkayê da "hespê Trûvayê" ne û Amerîka bi hevkarîya Kurdên Sûriyeyê dê rejima Beas ya Sûriyeyê jî hilweşîne!. Ev haletîrûhîyeya paranoîtîkî hakimî hukumeta Sûriyeyê, hemû Erebên Sûriyeyê, lê bi taybetî yê Dêrezor û dorberê ye. Lewma ew "tezahurata mutecawiz û provokatîv ya Erebên Dêrezorê" ya li "maça pêholê", xuya dibe ku ji aliyê "muxaberata Sûriyeyê" ve, gelek bi zanaî hatîye plan kirin. Erebên Dêrezorê, di nîveka Qamişlo da, ku sentrala polîtîkî û kulturî ya Kurdên Sûriyeyê ye, dê çawa cisaret bikin provakasyonê bikin, anjî êrişî Kurdan bikin? Ji ber vê yêkê, şîkek mezin heye ku ev provakasyonê parçeyekî planê destpêkirina êrişa "muxaberata Sûriyeyê", helbet bi destûra hukumetê, ya dijî Kurdan e. Ji xwe çawa "Dêzozî"yan dest bi provakasyonê xwe kirine, sîleh hatine kêşan û polîsên bi ûnîforma û yê sivîl êrişî bînerên pêholê yê Kurd kirine. Di wê arbedeyê da Kurdan jî xwe parast, lê ji ber ku provakator û êrişkar bi hazîrî bûn, biçûk mezin, gelek Kurd hatin kuştin. Hem di "maça pêholê" da, hem di rakirina kuştîyan û merasimên veşartina wan da, polîs, muxaberat û leşkerên Sûriyeyê teroreke nedîtî dane dest pê kirin, baskê êrişên xwe fireh kirin, şev û roj avêtin ser malan, xelk girtin, îşkenceyê nedîtî li wan kirin. Protestoya Kurdan jî gelek xurt, organîze û boş bû, lê êriş û terora dewletê jî hind dijwar bû û dom kir.

Dewleta Sûriyeyê boçi ev êrişê pêkîna? Ji serî were, Sûriyê parçeyekî konseptî Tirkîyeyê ya "antî Kurd û Kurdistan" e. Lê belê, dewleta Sûriyeyê di salên 70, 80 û heta dawîya salên 90î da, ji ber problematîkên Israîl, Lubnan û navçeyê û pozisyona Amerîka û Natoyê û herweha pirsên ava Firatê û Hetayê, digel Tirkîyeyê "sarûgerm" bû. Ji ber berjewendiyên

xwe û di şert û hewcehiyên konjonktûrel da, xwe durrî Tirkîyeyê dikir û "nermahîyek" nîşanî opozisyona dewleta Tirkîyeyê, hêzên Kurdan û "çepên Tirk" dida. Rewşa navînî jî binasekî sereke bû, ku digel Kurdan qet nebe nekeve nav rikeberîyekê. Çiku "klîka Elewî" hakimî Beas û hukumeta Sûriyeyê bû, ku Elewî grûba herî kêmanî ne li Sûriyeyê. Hafîz Esad û klîka Elewî polîtîka balansê didomandin di nav Sûriye û navçeyê da. Di vê "balans polîtîk"ê da, li nav welat dijî opozisyona xurt ya sunî, "birayên musulman", hewcehî bi Kurdan hebû. Li derve jî, daku beramberî Tirkîyeyê kartên xwe bi kar bîne dîsa pêdivî bi hêza Kurdên bakur didît. Rekabeta Beasa Esad û Beasa Seddam jî, ji xwe ji berê were dom dikir. Di nav wan konjonktûr û "balans polîtîk"ê da Kurdan jî hewcehî bi diyalog û "nermahîya" Sûriyeyê hebû. Hem Kurdên başûr, hem yê bakur ji vê "rewşa taybetî" istifade kirin. Sûriyeyê ji ber vê "balans polîtîk"ê navxweyî û derveyî, dengê xwe li Kurdên "xwe" nekir, bi "nepenî" digel wan têkilî dana, lê çu cara hebûna wan ya îdentîteta polîtîk û etnîkî qebûl nekir. Maf û azadiyên polîtîk, kulturî û etnîkî nedan. Kurdên Sûriyeyê jî, hem ji ber rewşa xwe, hem jî ji ber Kurdên başûr û bakur, berpêyên dewleta Sûriyeyê teng nekirin, opozisyoneke xurt û dijwar nekirin. Lê belê, piştî şerê Kuweytê û şkestina Seddam û rizgar û azadbûna Kurdistanê Başûr, teraziya navçeyê serûbin bû. Tirkîyeyê bizava "antî Kurd"îyê germ kir, têkilîyên xwe digel Iran û Sûriyeyê xurt kirin.

Di vê konjonktûra nû da dewleta Sûriyeyê jî dest bi badana dîreksiyona polîtîka xwe kir û hêdî hêdî xwe ji Kurdan durr kir û polîtîkên xwe yê goya "nerm", li ser Kurdan şidandin. Tirkîyeyê ev rola xwe ya bêyûm hind pêşve bir, ku hukûmeta Sûriyeyê di nêzîkî dawîya sala 1998ê da bi fişar û tehdîtên Tirkîyeyê, lîderê PKKê Ebdula Ocalan ji Sûriyeyê derêxist. Ji wê demê pêve, dewleta Sûriyeyê têkilîyên xwe digel Tirkîyeyê pêşve birin û "balans polîtîk"ê beramberî Kurdan terk kir. Vê guhorîne tesîreke gelek negatîv li ser jîyana Kurdên Sûriyeyê kir, ku terora dewletê rûyê xwe yê bêyûm û sar dîsa ve nîşan da, kar û xebatên polîtîk û kulturî hatin asteng kirin, dest bi girtinan kirin. Bi hatina Beşîr Esad têkilîyên Tirkîyeyê xurttir bûn. Xurtbûna van têkilîyên Sûriye û Tirkîyeyê, jîyana Kurdan kire jahr. Ji xwe piştî ku rejîma Seddam hilweşîya û hate girtin, Iraqê renegeki nû wergirt û Kurdistanê Başûr, cografîyên wekî "rêvebirîya Kurdistanê" di makqanûna demkurt ya Iraqê û meydana navnetewetîyê da fermîyet wergirt, helwesta dewleta Sûriyeyê êcarî dijwar bû beramberî Kurdên navxwe û yê derve. Dewleta Tirkîyeyê jî hindî jê hat hukûmeta Sûriyeyê zêrand. Di van şertan da Beşîr Esad di serê meha Çileyê evsale da li Enqereyê hate mêhvan kirin û enîya "antî Kurd û Kurdistan" hate nûve kirin û xurt kirin. Hukûmeta Sûriyeyê û Beşîr Esad, tam ketine nav devê meqesa Tirkîyeyê û mengenyê li ser stuyê Kurda dişidînin. Êrişên li 12ê Adarê li Qamişlo, Heleb, Kobanî, Efrîn û bajêrên dî, yê dijî Kurdan pêkhatî, pêkve girêdayî vê konseptê ne. Sûriyeyê rota xwe zivirandîye ber bi Tirkîyeyê ve ku ew rota bo desthilata Beşîr Esad xêrê naine. Beşîr Esad û rêvebirîya wî hindî nêzîkî dewleta Tirkîyeyê dibe, hind "antî Kurd" dibe ku ev polîtîke dê dûmahîka wî û rejîma Beasê bîne.

Helwesta organîzasyonên Kurdên rojhilatabaşûr

Di organîzebûna Kurdên Sûriyeyê da "karakterîstîkeke xweser" heye. Baskanêya li başûr û bakur dîrekt sîrayetî wê derê dike. Pozisyona partîyên Kurd yê Sûriyeyê, li goreyî meylardîya hêzên başûr û bakur reng werdigire. Eve heke rûyê negatîv be, rûyê pozîtîv yê organîzasyonên Kurdên Sûriyeyê jî "karakterîstîk" e. Biçûk mezin organîzasyonên Kurdên Sûriyeyê, rekabeta hevdu bi normên relatîven "demokratîk" dîkin. Di navbeyna wan da kem û kêmanî jî be, diyalog heye. Zû parçe dibin, lê zû jî "cepheyên" ava dîkin. Digel hevdu dijminahîyeke "kor" nakin. Eve pozîtîvîyeke balkêş e di jîyana organîzebûna Kurdên Sûriyeyê da. Lewma jî, gava "mûsîbetek" bi serê wan têt, zû li hevdu kom dibin, tèn hawara hev û pratîkeke hevrayî pêktînin. Ev helwesta wan ya pozîtîv di van bûyerên Qamişlo da jî hate dîtin. Zû li hev kombûn, koordînasyonêke pratîk danan û serhildan û berxwedana xelkê bi kêmasî jî be kontrol kirin. Vê aktîvîya wan, rê li ber felaketêke mezintir birî. Hem xelk organîze kirin, hem jî kontrol kirin û bi vê yêkê provakasyona dewletê asteng kirin û herweha hêza xwe jî nîşanî dewletê dan ku "ew hene"! Helbet di formûlekirin û programkirin û herweha pratîzekirina xwastekên polîtîk û kulturî da, organîzasyonên Kurdên Sûriyeyê ne gelek dînamîk û produktîv in. Eve lawaztirîn aliyê wan e ku nikarin hemleyên polîtîk bikin beramberî dewleta Sûriyeyê. Bêvîzyonîya wan ya ji vî alî ve, li beramberî dewleta Sûriyeyê dest û pêyên wan girêdide ku eve zeafêke mezin e. Ev kêmasîya wan di hevdişînê digel rêvebirên hukûmeta Sûriyeyê da jî hate dîtin. Li ber tehdîtên dewleta Sûriyeyê, koordînasyonêke rêxistinên Kurdên Sûriyeyê bang li Kurdên parçeyên dî û diasporayê kir ku "pîrsê" gelek "enternasyonalîze" nekin! Eve bi gotina herî "nerm" bêçaretîya wan nîşan dide, ku hem polîtîken, hem jî etîken kêmasî û şaşî ye!

Piştigirîya neteweyî û sînerjîya Kurd

Êrişa dewleta Sûriyeyê ya ji 12ê Adarê pêve li Qamişlo û bajêrên dî yê Kurdan û berxwedana xelkê Kurd çawa dest pê kir, bi saya serê teknolojiyê û ragihandina elektrônîk, hem li çarnikarê Kurdistanê, hem jî li seranserê dinyayê zû deng veda. Wekî her felaketêke neteweyî, vê carê jî ji Kurdistanê Rojhilat bigirin heta Kurdistanê Bakur, Kurdistanê Başûr û meydananê diaspora Kurdan, li Tirkîye, Ewropa, Amerîka û cihên dî, timamî xelkê Kurd bi yêk deng, di bin alaya Kurdistanê da, dijî êrişkarîya dewleta Sûriyeyê nerazîbûna xwe nîşanda û digel Kurdên Sûriyeyê jî piştevanîya xwe diyar kir. Ji bo yar û neyara, heyecan û helwesteke neteweyî hate nîşandan ku vê yêkgirtina Kurdan, li merkezên dîplomasiya cîhanê jî deng veda û bi serê lêvan jî be hem Amerîkayê, hem jî Ewropayê dewleta Sûriyeyê hişyar kir ku kuştin û girtina Kurdan bihêle. Heke dewleta Sûriyeyê, xwe paşve kêşa be, eve di serî da ji ber berxwedana Kurdên Sûriyeyê ya organîze, paşê jî, ji ber piştevanîya timamî Kurdistanîyan û çîhana humanîter, pêkhat. Kurdên Sûriyeyê bi tinê nehatin hêlan. Kurdan li timamî Kurdistanê û derveyî welat, dijî êriş û terora 1ê Sibataê li Hewlêrê jî deng û pratîkeke yêkgirtî nîşandan ku eve xewnên dewletên dagîrker yê Kurdistanê û enîya "antî Kurd" ya li rojhilatanavînan direvîne. Di hemû mûsîbetên bi vî rengî da, ev helwest û heyecana neteweyî ya xelkê Kurd pêktêt, ku eve sînerjîya Kurd jî derdêxe meydane ku garantîya xelkê Kurd ya rastî û bîngêhîn jî ev e. Em hêvî dîkin ku ev sînerjîya Kurd bête xurttir û mezintir kirin.

IV.

Newroz 2004

Wekî hercar, xelkê Kurd ev sale jî hazîrîyên xwe ji serê meha adarê pêve kiribûn ji bo pîrozîya cejna neteweyî, Newrozê.

Lê belê, berî Newroza evsale, 1ê Sibatê, hem li Hewlêrê êrişeke terorane hate kirin û ji sedan pitir kadroyên bijare yên PDK û YNKê û xelkê sade hatin kuştin û gelek jî birîndar bûn, hem jî di 12ê Adarê da li Qamişloyê polîsên sîvil û bi unîforma yên dewleta Sûriyeyê, digel provakatorên kirêgirtî yên xwe, êrişî xelkê kirin û gelek kes kuştin, bi sedan jî birîndar kirin û girtin. Heta 20ê Adarê jî dewleta Sûriyeyê ev terora xwe ya dewletî di maksîmûm dereceyê da domand. Nihe jî gelek girtî hene û aqîbeta wan ne diyar e. Xelkê Kurd, li çar nîkarê Kurdistanê û li meydananê diasporayê, bi van xem, kul û keseran û herweha şabûna fermîyet wergirtina Kurdistanê Başûr ya di "makqanûna demkurt ya Iraqa Federal" da, pêşwaziya Newrozê kir. Lê ji reaksiyonên dijî herdu êrişan û pîrozîya fermîbûna statuya Kurdistanê Başûr, kîvş bû ku, xelk dê timamî giranahîya xwe bide ser pîrozîyên Newrozê, ku hêza xwe nîşanî yar û neyaran bide. Newrozê Kurdistanê Bakur di atmosfera hîlbijartinan da bûne aksiyonên polîtîk. Tinê li Diyarbekirê milyonek xelk kombû û Newroz kire meydana daxwaz û xwastekên neteweyî.

Ji Hekarî û Wanê bigirin heta Qers, Batman û heta Urfayê û li diasporayê jî li Mersîn, Enqere û Stanbolê, Izmîrê nêzîkî du milyon û nîvan kes di meydanan da hem Newroz pîroz kirin, hem daxwaza berdana serokê PKKê Ocalan û hemû girtîyên polîtîk kirin, hem êrişên Hewlêr û Qamişloyê protesto kirin û hem jî piştevaniya fermîbûna Kurdistanê Başûr kirin. Li Kurdistanê Başûr, ji ber êrişên li Hewlêrê, derketina geşt û seyrana teng hate girtin, lê li bajêr û gundên dî, Newroz bi coş û heyecaneke bilind ya neteweyî hate pîroz kirin. Pîrozîyên li Rojhilata Kurdistanê jî, di serî da li Mahabad, Urmîye û bajêrên dî bi boşahiyeke mezin hate pîroz kirin. Kurdên Sûriyeyê jî, digel hemû çavtirsandinên rejima Sûriyeyê jî, hem Newroz pîroz kirin, hem jî êrişên dewleta Sûriyeyê protesto kirin. Li diasporayê jî, li Ewrûpa, Amerîka û cihên dî jî, Newroz wekî demonstrasyoneke polîtîk hate pîroz kirin. Xwastekên Kurdan bi rêvebirîyên welatên lê ra hatin gihandin. Li çarnîkarê Kurdistanê û derveyî welat di pîrozîyên Newrozê da, xelkê Kurd bi tevahî li ser pêya bû û bi aktîvî û gelek dînamîk xwezî û daxwazên xwe bi dengê bilind gotin.

Di van pîrozîyên Newrozê da, li seranserê Kurdistanê, tiştek gelek vekirî derkete meydane ku ji bo hemû dewletên kolonyalist, bo Ewrûpayê û bi taybetî jî bo Amerîkayê bû mesajê xurt, anjî em wisa hevî bikin. Belê, ya herî giring, di serî da Amerîka, ku "projeya rojhilatanavîna ya mezin" daye dest pê kirin, heta ku digel timamî Kurdan, li hemû parçeyan, alyansekê pêkneîne, nikare vê projeya xwe realîze bike. Di nimûneya Iraqê da jî hate dîtin ku, lokomotîfa demokratîzasyona rojhilatanavîna Kurd in. Mexdûrên rojhilatanavîna Kurd in. Demokrasî tinê bi hêz û şiyana "mexdûran" tête ava kirin. Heke Amerîka, Ewrûpa û hetta Israîl, dixwazin ku rojhilatanavîna bigihe tenahî û aramiyê, çare û kilîl, Kurd in. Heta ku eniya demokrasîyê digel Kurdan neête danan, hemû maf û azadîyên Kurdan neête dan û garantî kirin, heta ku dewleta Kurdistanê li nîveka vê cografyaya bi arêşe û alozî, neête ava kirin, ne demokrasî, ne jî tenahî naête rojhilatanavîna û navçe ji şer û belayan xilas nabe. Kurdan hem ew hêz û potansiyel, hem jî tecrube û kapasîte heye, ku lokomotîfiya demokratîzasyona rojhilatanavîna bikin. Kurdan eve hem di operasyona Iraqê da, hem di midehê deh salên îdareya xweser ya di navbeyna salên 92-2003 da li başûr, hem jî bi kêma û kasî jî be di desthilatîya şehridariyên Kurdistanê Bakur da û herweha di van pîrozîyên Newroza 2004ê da, ku bi milyonan xelk li ser pêya bû, baş nîşan da ku ew hazîrî demokratîzekirina rojhilatanavîna in. Adresa demokratîzasyona rojhilatanavîna kîvş bûye. Divêt Amerîka û Ewrûpa hisabên xwe li ser vê realîteyê bikin ku hem ya rast ev e, hem jî li goreyî berjewendîyên wan bi xwe jî tiştê ku divêt bikin ew e. "Projeya rojhilatanavîna ya mezin", rojhilatanavîna û demokrasî û asayîş û ewlehî dibêjin? Bersiv, çare û kilîl Kurd in!

Anketa peydakirina potansiyela hêza xelkê Kurd, Newroz in û Newroz, ji aliyê xelkê Kurd ve, wekî hersal, evsale jî, bi ruheke şoreşgerî û têkoşerî hate pîroz kirin.

Têbînî - I

21ê Adarê, herweha "roja dijî nijadperestîyê ya navneteweyî" ye. 21ê Adara 1960ê, li bajêrê Sharpeville li Afrîka Başûr, di demê rejima "apartheid"ê da, reşikan ji bo mafên xwe demonstrasyoneke aştîyane kirin. Polîsên rejima rasîst, bi sîlehan êrişî reşikan kirin û 69 kes kuştin. Vê terora rejima apartheidê ya Afrîka Başûr, infialeke mezin peyda kir di meydana navneteweyî da. Protestoyên mezin pêkhatin. UNê [Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan] jî, li sala 1966ê bi biryareke fermî, roja 21ê Adarê, wekî „roja dijî nijadperestîyê ya navneteweyî“ qebûl û îlan kir. Ji hingê were, her sal 21ê Adarê, „nijadperestî“ tête protesto kirin û kuştîyên reşîk tête birînan. Eve, digel Newrozê rasthatîneke balkêş e. Di serî da dewleta Tirkîyeyê û dewletên dî yên dagîrker, Iran û Sûriye, polîtîkên xwe yên "antî Kurd û antî Kurdistan" di çarçoveya nijadperestîyê da didomînin. Xelkê me berî hizaran salan dijî zulm û zordariyê têkoşîn daye û di 21ê Adarê da, dawîya desthilata Dehaq, ku sembolê zulmê ye, înyaye û ew roj bo xwe kirîye cejna azadîyê û wekî rojê nû, navê Newrozê lê kirîye. Mana û naveroka Newrozê û biryara UNê ya „dijî nijadperestîyê“ hevdu timam dike. Xelkê Afrîka Başûr, bi têkoşîna xwe ya salan evro gihîştîya xwezîya xwe. Xelkê Kurd, hêj jî li van sê dewletan, Tirkîye, Iran û Sûriyeyê, diskrimînasyonê mezin dibîne. Xelkê Kurd, her 21ê Adarê, ji bilî pîrozîya cejna neteweyî, Newrozê, zor û zulma van dewletên kolonyalist û nijadperest jî protesto dike. Xelkê Kurd, her 21ê Adarê, digel pîrozîya cejna Newrozê, divêt dijî „nijadperestîya navneteweyî“ jî têkoşîna bide ku ji xwe nijadperestîya herî mezin xelkê me bi xwe dibîne.

Newroz 2004

Gava meha adarê hat, heyecaneke mezin tûşî Kurda dibe. Ji ber ku adar meha Newrozê ye û Newroz hem cejna neteweyî, hem jî mizgîniya xêr û bêra demsala biharê ye. Newroz ji bo Kurdan di serî da bûye sembola huvîyeta Kurdayetîyê. Kurd bi pîrozîyên Newrozê hem vê huvîyeta xwe îfade dikin, hem xwastek û daxwazên xwe bi dengê bilind pêşkêş dikin û ya herî giring jî hebûna xwe, bi hemû heyîyên xwe yên neteweyî, bi cil û bergên xwe, bi xwarin û vexwarinên xwe, bi stran û govendên xwe û bi yêkdengî nîşanî hemû alemê didin. Ji serê adarê pêve bizavên pêkînan pîrozbahîyên Newrozê dest pê dikin û heta dawîya adarê ev şahî dom dikin. Û Kurd salê carekê, di Newrozê da hemû hêz û şiyana xwe dikin yêk, agirê azadîyê vêdêxin û pêkve bi dengê gur dibêjin; em Kurd in, em hene, em dixwazin li

ser axa xwe, li welatê xwe Kurdistanê serbixwe, azad û bextewar û digel cîranên xwe jî di nav aştiyeke dadyar da bijîn. Bila Newroza me, li me û hemû der û cîranan û timamî mirovahiyê pîroz be!

Newroz, anku roja nû, anjî "nûroj", wekî efsane, herçend malê hemû xelkên Iranî jî be, Kurd bi mana û naveroka xwe ve, ji xelkên di yên Iranî cudatir di Newrozê digihe û pîroz dike. Her di serî da Kurd Newrozê wekî cejna neteweyî ya xwe qebûl dikin û bi vê manayê pîroz dikin. Newroz, bi vê mana û naverokê, yêkem cejn e ku di seranserî Kurdistanê û nav Kurdên diasporayê da yêkdil têtê pîroz kirin. Ji ber hindê, Newroz, di nav xelkê Kurd da, ji rengê adetî zêdetir, bi rengekî polîtîk û têkoşînî têtê pîroz kirin. Kurd Newrozê wekî cejna serhildanê, berxwedanê, têkoşîna ji bo azadîyê û rizgarbûna ji bin nîrê zulm û zordariyê qebûl dikin û bi vê rûhê pîroz dikin.

Aktorên efsaneya Newrozê

Di nav xelkên Iranî da gelek versonên mîtolojîya Newrozê hene. Di ya Kurdan da, du aktor û semboleke efsaneyê hene: Wekî aktor, Dehaq û Kawa û wekî simbol jî Agir. Dehaq, temsîla zulm û zordariyê dike. Kawa, temsîla têkoşîna organîze ya azadîyê dike. Agir, ku di bawerîya mîstîk ya Kurdan ya kevin da jî pîroz e, di bûyera efsaneya Newrozê da jî temsîla azadbûn û rizgarbûnê dike.

Li goreyî vê efsaneyê, berî 2616 sala Dehaq, wekî hukumdar, zulmeke nedîtî li xelkê dikir. (Anku NEWROZA evsale, herçend dibe 2616 salî jî, belê demên bûyerên mîtolojîk û efsanewî sedased ne kîvş û ne jî misoger in). Bi navê xelkê zorlêkirî û bindest jî Kawayê asinger rêberîya xelkê kir, berxwedaneke mezin pêkîna û di 21ê Adarê da êrişî seraya Dehaq kir û bi mircê xwe, ew zalimê zalima kuşt û xelk ji wê zulmê rizgar û azad kir. Xelkê jî ev azadbûn û rizgarbûn, bi vêxistina agirên gur pîroz kir. Ji wê rojê pêve agir dibe sembola azadbûn û rizgarbûna ji zulmê û 21ê Adarê jî dibe roja azadî û rizgarîya xelkê Kurd. Ew roj li goreyî demên salê destpêka biharê ye jî û 21ê Adarê hem wekî vejîna demsala biharê, hem jî roja serkevtin, azadî û rizgarîya xelkê Kurd, dibe cejna jîneke nû ya xelkê Kurd û xwezayê. Vejîna xwezayê û herweha vejîna xelkê Kurd ya nû hevdu timam dikin û bi hev ra Newrozê pêktînin.

Helbet piştî rizgarbûna wê demê, şahîya xelkê Kurd mixabin dirêj nakêşe û demê bindestiyên nû dest pê dike. Dehaqên nû derdikevin, zulm û zordariya li ser Kurdan di nav dem û salan da heta evro didome. Lê belê, xelkê Kurd jî di nav van salên dijwar da, Kawayên nû ji nav xwe derdêxe û berxwedana xwe sist nake û di her 21ê Adarê da vê cejna xwe bi ruheke têkoşerî û şoreşgerî bilind dike. Ev têkoşîna xelkê Kurd car têkdiçe, car serdikeve û bi ketûraban dom dike, lê pîrozîya Newrozê qet naête rawestandî û di her dem û şertan da agirê Newrozê têtê vêxistin û gur kirin. Li ser vê efsaneyê, her cure edebîyat têtê ava kirin. Ji destana bigirin, heta helbest, stran, şano û baskên di yên edebîyatê têne hûnandin. Newrozê hem wekî efsane, hem jî wekî cejna neteweyî di hemû kar û xebatên helbestvan, hunermend û nivîskaran da cih girtiye. Newroz bûye ilhama jîyana hunerî û edebîyata Kurdî. Her di serî da filozofê mezin Ehmedê Xanî di destana xwe ya mezin, Mem û Zînê da bi firehî behsê Newrozê kirîye. Şeref Xanê Bitlîsî, di dîroknemeya xwe, Şerefnameyê da, bi dirêjî cih daye efsaneya Newrozê. Evroke li ser Newrozê bi sedan berhem hatine nivîsîn.

Newroz di timamî jîyana Kurdan da bûye sembola azadîyê. Xelkên di yên Iranî wekî cejneke adetî û folklorîk pîroz dikin, belê Kurd wê wekî cejneke polîtîk ya têkoşîna azadî û rizgarîyê pîroz dikin. Ji ber vê yêkê ye ku di Kurdistanê da, rejimên dagîrker pîrozîyên Newrozê qedexe kirine, wekî bizaveke mezin ya polîtîk dîtine û di her 21ê Adarê da teroreke nedîtî li ser xelkê Kurd gêrandine. Rejimên dagîrker di her 21ê Adarê da vêxistina agir, derketina geşt û seyrana qedexe kirîye. Gelek têkoşerên Kurd ji ber pîrozîyên Newrozê hatine girtin, hetta hatine kuştin. Ji ber hindê ji bo Kurdan Newroz xwe nişandaneke neteweyî ye. Ji rojhilat bigirin heta rojavayê, ji bakur bigirin heta başûra Kurdistanê û derveyî welat, di pîrozîyên cejna neteweyî ya Newrozê da, yêkitiya xelkê Kurd jî pêktêt. Kurd bi hemû hêz û taqeta xwe ve û bi heyecaneke mezin her 21ê Adarê xwe amadeyî vê pîrozîya dîrokî dikin û çu asteng wan ji pîrozîya vê cejna neteweyî sar nakin. Kurd meydanan bi sedhizaran, tijî dikin û gazî û hawara xwe ya azadîyê bilind dikin. Ji 1992ê were li parçeyekî azad yê Kurdistanê, li Kurdistana Başûr, bi şahîyeke mezin, di nav azadîyê da têtê pîroz kirin. Li parçeyên di jî, milyonan Kurd dadikevin kuçe û kolana, meydana, mêrg û çîmena û agirê azadîyê vêdêxin û strana Newrozê bi dengê bilind û xurt dibêjin.

Newroza 2004ê jî dê bi haziriyên rengareng li seranserê Kurdistanê û derveyî welat bête pîroz kirin. Dengê strana azadîyê ya Newrozê hêj ji nihe ve li gund û bajêr, çiya, zozan û deştên Kurdistanê dengvedide. Agirê gur yê Newroza pîroz hêj ji nihe ve hatîye vêxistin. Bi navê hemû xelkê Kurdistanê, li bakur Diyarbekir (Amed), li başûr Hewlêr, li rojhilat Mahabad, li başûrarojava jî Qamişloyê meydanên xwe hazirî pîrozîya vê cejna neteweyî, Newrozê, kirine. Ji nav van bajêran, Hewlêr hem ji ber terora 1ê sibata evsale birîndar e, hem jî yêk ji serbajêrên azadkirî yê Kurdistanê ye. Û têtê hêvî kirin ku parçeyên di yên Kurdistanê jî azad û rizgar bin û Newroz li timamî Kurdistanê, di nav azadîyê da û bi şahîyeke mezin bête pîroz kirin.

Newroz bila li xelkê Kurd pîroz be.

**

Newroz di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da [*]

Ehmedê Xanî di Mem û Zînê, bira 11 û 12an da wisa dibêje:

Destana beyana Newroza sultanî tesmîyeê mewsimê suru û şadimanî bi mersûmê qedîme Kurdistanî ku wan digotinê „sersal“ ed dikirin bi eydê wîsal

Bira 11an

hindek di mîsalê Zîn zerî ne

hin şubhê Memê di mişterî ne

...

Danayê muemmerê kûhensal

Ev rengê he go ji bo me ehwal
Go: Adetê pêşiyê zemanan
Ev bû li hemî cih û mekanan:
Wextê we ku şehsuwarê Xawer
Tehwîl-i dikir di mahê Azer
Yanî ku dihate bircê Sersal
Qet kes nedima di mesken û mal
Bîlcumle diçûne der ji malan
Hetta digihîste pîr û kalan
Roja ku dibûye eyda Newroz
Tazîm-i ji bo demê dilefroz
Sehra û çemen dikirne mesken
Beyda û demen dikirne gulşen

Bira 12an
Bi derketina şehriyan e bi deştê ji bo seyrana sersal û geştê
Dewra felekê ji bextê feyroz
Dîsan ku numa ji nû ve Newroz
Mebnî li wî adetê mubarek
Şehr û sipahîyan bi carek
Bajêr û kelat û xanî berdan
Teşbîhê bi nijdîyan û cerdan
Sef sef diçûne kûh û deştan
Ref ref dixuşîne seyr û geştan
...
Hindek bi peyayî çûne baxan
Hindek bi suwarî çûne raxan
...
Sewdakirê eşqê bûn di bazar
Hem bayiê husn û hem xerîdar
Sersalî û bakir û ruwalan
Sedsalî-w ciwan û pîr û kalan
Sersal-î li resm û rahê mahûd
Gêran di cih û meqamê mehmûd

** [Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, amadekarîya M. Emîn Bozarslan]*